Das Lehrstellenprojekt 16+ der Schweizerischen Konferenz der Gleichstellungsbeauftragten motiviert Mädchen zu einer offenen Berufswahl und zeigt Knaben erweiterte Lebensperspektiven.

Ein Projekt im Rahmen des Lehrstellenbeschlusses 2 des Bundesamtes für Berufsbildung und Technologie BBT.

JI DIBISTANÊ BERBÎ PÎŞE YÊ

Agahiyek ji bo malbatan (kurdisch)

Malbatên hêja

Keçik û lawikekî we yî ku di 7., 8., 9. an jî di sinifa 10. an de heye. Lawik û keçika we divê ku pîşeyekî (meslegekê) an jî,ji bo dibistaneke dîn a ku pêşva dibe biryara xwe bidin.

Plan û amadekarî derfet û îmkanên kariyêreke baş ji bo destpêka cîhana kar a serkevtinê pêk bîne. Hilbijartina pîşeyeke rast a taybetî ji bo keçikan pir mûhîm û girîng e. Digel vê yekê pîşeyên pêşe demî bi dest bixin.

Dibistan û şêwirmendiya pîşeyê (meslegê) alîkariya ciwanan bo hilbijartina perwerdeya pîşeyê (meslegê) dike. Berpirsiyarî li ser milê yê ku dixwaze pîşeyê bikiye. Lawik û keçika we divê bi xwe hewl bidin ku hetanî ku cihekî pîşeya perwerdeyê dîtine.

Bi tevayî ev ji bo piran pir zor û dijwar e. Piraniya wan hîn jî nebûne. Ji bo vê pir girîng e ku, dê û bav alîkariya zarokên xwe bikin.

DIBISTAN ÇAWA ALÎKARIYÊ DIKE?

Dibistan şagirtê/î di pola 8.û 9. an de ji bo hilbijartina pîşekî an jî, ji bo dibistaneke dîn a ku hîn pêşva dibe amade dike.

ŞÊWIRMENDIYA PÎŞEYÊ ÇAWA ALÎKARIYÊ DIKE?

Navenda agahiya pîşeyan (BIZ) di derbarê cihê kar û perwerdeya pîşe de agahiyan pêşkêş dike. Hemû şagirt dikarin li ba navenda şêwirgehê şêwirîneke bêdirav bikin.

Lehrstellenprojekt 16+, Wilhelmstrasse 6, 8005 Zürich, Tel. 01 271 44 90, 16plus@16plus.ch, www.16plus.ch

Quelle: Zentralstelle für Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung, Kanton Bern, www.erz.be.ch/bamtour

Û ÇI PÊWÎSTE KU CIWAN BI XWE BIKIN?

LI DESTEGÊ BIGERE Û ALÎKARIYÊ QEBÛL BIKE

Linda dixwaze bibe (Polymechanikerin). „Oh xwedeyo“ ev çi ye, dibêje bav. „Di kultur û çanda me de jin hînî pîşeye (meslega) mêran nabin.“ Birayê wê yê ku va çar salin ku di perwerdeya pîşeya Polymechanikirê de ye. Bawer dike ku ew nabe. Tu li wir hemû roj bi mêran va ye. Kêfa te ji vê re naye. Ti jinê ku tu bikaribe pê re bipeyivî tune ne. Ji bo ku yên dîn te qebûl bikin divê tu ji wan bêtirtir kar bikî. Ez vê dizanime, li ba me jinek hînî pîşeye Automatikerin dibe.“

Linda yê li hember van derketinan dîsa serîlêdana (qeyda) xwe ji bo ceribandina pîşeyê kir.
„Dawiya ceribandina pîşeya heftekî Linda yê got, hûn herdu jî mafdar in. “Ez li kargehê keçikake tenê me.“
Lê ji min re çi ye.Karê bi makînan û bi hêsinan re kêfa min pê re tê ye.
Ez dixwazime bibim Polymechanikerin. Eger hûn alîkariya min bikin ezê serbikevim.“

XWE BI XWE BINASIN

Ez çi bi kêfxweşî dikime (Înterese gîştî, Hobî, dersên tên têrcîh kirin)? Ez çi baş li dibistanê dikime, ez di wexta vala û li ba malbatê xwe hînî çi bûm? Wekî mînak W.M bi zimanên cûda peyivîn, tamîr kirine hacetên malê û duçerxan, li zarokan mêzekirin û danûstendin.

- ✓ Bi malbatê va derbarê pîşeyê de bipeyivîn û ji wan bipirsin:
  Kîjan kar ji bo min baş e?
- ✓ Bi mamosta/e ve bipeyivîn: Almanî, Fransî û Matematîka min têrî dike? Li ku derê kêmasiyên min hene? Li ku derê ez dikarim xwe ji bo perwerdeya pîşeyê amade bikim?

NASÎNE PÎŞEYÊ

Pîşeyên çawa hene? Mirov li wê derê çi dike? Pêwendî û eleqeyên çawa tên pirsîn? Divê ku mirov çi baş bikaribe?

- ✓ Herin BIZê, xwe agahdar bikin, Wêneyên pîşe û Videyon mêzekin.
- ✓ Biryara têrmînekê bi şêwirmendiya pîşê re bigrin û jê bipirsin: Amadekariya min ji bo pîşeya ku hînî bibim têrî dike? Heke kêmasiyên min hebin ez dikarim çi bikim?
- ✓ Serîlêdane kargeh û rêvebiriye pîşeyê bikin.
- ✓ Perwerdeya pîşê bike.

PÎŞE AN JÎ DIBISTANÊ HILBIJÊRI

Rast e, înterse û qabiliyeta min ji bo pîşeye ku ez dixwazim bikim?

- ✓ Kêmtirîn 1-2 alternatifên pîşeyî ku di cî de, an jî, ji bo dibistaneke ku hîn bêtir pêşva dibe hilbijêrin.

JÊ BIPIRSIN Û HÎNÎ BIBIN

Django va demeke kin a ku li Swîsrê yê dije û serîlêdana xwe ji bo dibistana navîn kir. Lê ev li pêşiya hilbijartina pîşeye wî dibû asteng. Pîşeya ku wî dixwast bike Kîmya Laborantî (Chemielaborant) bû. Lêbelê pîvanên dibistanê ku li hemberî vê serîlêdana xwasteke wî dibûn asteng kir. Kargehê wekî şagirtiya Laborîstê pêşniyazî wî kir. Malbata wî di wê baweriyê de bûn ku, divê ew vê perwerdeyê ji bo destpêkê bike û bi vê riyê di nav cîhana kar de cihê xwe bigre.
„ Ez li vê zêdetir dikarim bikim, ez vê dizanime.“ Ew pir li ber vê diket. Dawiya nirxandineke dirêj bi malbata xwe va, Django telefonî kargehê kir û pirsî, çi kêmasiyên min ji bo şagirtiya Kîmya Laborantê (Chemielaborant) hene. Kargehê bersiv da û got. Kêmasiyên we di warê Almanî û Matematîkê de hene.
Malbata wî ew şandin dibistaneke taybetî. Ew hîn dibû û carek dîn hîn dibû. Dawiya çend mehan şunva wî kargeh îkna kir ku kursa ceribandinê careke dîn dubare bike. Wî dereceyeke baş di kursê de girt û pêymana Django ya ku Laborîst wekî Chemielaborant hate guhartin.

LI CIHEKÎ PERWERDEYÊ BIGERIN

(Li gorî pîvanan di sinifa 9. an de di Payîzê de)

- ✓ Li ku derê cihê perwerdeya ku ez dixwazim bikim hene?
- ✓ Li ku derê dibistanên baştir ji bo pêşva birinê hene?
- ✓ Divê ez çi bikim ku ez cihekî perwerdeyê bi dest bixinim?

CERIBANDINA DUYEMÎN

Bi rastî Hyrie raste rast dizane ew hînî çi bibe: Xêzkirine avahiyên bin û ser erdê (Hochbauzeinerin) . Bavê wê li ba hevalê hevalekî cihê perwerdeya pîşeye dît. „ Dawiya ceribandina pîşeya heftekî Mîmar (Architekt) got: „ Keçik bi huner a,“ Lê rewşa wê! Tim dipê, hetanî ku me tiştek hînî wê kiriye. Bi serê xwe tiştekî nepirsê.“ Bav ne li bendê vê bû. Û bi vî awayî Hyrie salekê perwerdeya îdarê malekê û li çar zarokan mêzekir. Wê dida xuyakirin ku bi vî awayî baş e. Ez ji zarokan hezdikim. Min zanî ku, ji bo pîşeya ku ez dixwazim bikim, hewl bidim û bikaribim hînî pîşeya xwe bim. Wê hemû cesareta xwe berhev kir û ji Mîmar (Architekt) pirsî û ew nikare careke dîn heftekî pîşeyê biceribîne. Wî erê got; lê îsal ti cihê perwerdeya şagirtî nema. Vê carê Hyrie yê karê xwe baş dikir. Ne tenê bavê wê herweha Mîmar jî, ji bo lêgerîne cihê perwerdeya pîşekî alîkarî dikir. Niha Hyrie yê hînî Xêzkirine avahiyên bin û ser erdê (Hochbauzeinerin) dibe.

JI BO HILBIJARTINA PÎŞE AN JÎ DIBISTANEKE KU PÊŞVA DIBE PÊWÎSTÎ BI WEXTÊ HEYE HEWCEDARIYA LAWIK Û KEÇIKÊ BI ALÎKARIYA WE HEYE

HÛN DIKARIN ALÎKARIYA KEÇIK Û LAWIKÊ XWE BIKIN

Wekî dê û bav derfet û îmkanên we yên cuda cuda ji bo hilbijartina pîşye keçik û lawikê xwe. Hûn dikarin bi awayekî aktîf ji bo lêgerîne cihê perwerdeya pîşekî bibin desteg û alîkar.

SEREDANÎNA SAZIYA DIBISTANÊ YA MALBATAN BIKIN

Di civînên malbatî de agahiyên pir girîng û hewldanên mantiqî û hilbijartina pîşe û lêgerîne pîşeya perwerdeyê tên rojevê. Hûn lî wê derê di derbarê sîstema hilbijartina pîşeya Swîsrê de dibin xwedî agahî û hûn bi vî awayî dikarin hîn baştir ji bo keçik û lawikê xwe ji bo pîşekî bibin alîkar.
Hûn jî, dikarin serpêhatiyên xwe bi malbatên dîn re ku temenê zarokên wan ên ku hemsaliyê zarokê we ne va biguharînin.

TORA RAGIHANDINA XWE BIKARBÎNIN

Di cihê ku hûn kar dikin de, di Klûb û komeleyan de an jî, li ba nasên xwe û li her derê ji bo lêgerîne perwerdeya pîşeya keçik û lawikê xwe kontakt û têkîliyê xwe bikarbînin û bînin zimên. Belkî mirovek an jî, kargeheke weha ya ku pîşeya perwerdeyê pêşkêş dike dizane an jî, xwe wekî mirovê kontakt û têkîliyê pêşniyaz bike.

BIZAVDAR KIRIN (CESARET DAYÎN)

Rewşa aboriya îro ji bo ditîne cihê perwerdeya pîşekî (meslegê) qet hêsan nîn e. Divê keçik û lawikê we di vê rewşê de pir bi înîsiyatîf û li berxwe bidin. Hûn jî dikarin serpêhatî û tecrûbeyên ku wê/wî kirine bi wan re parve bikin. Dawiya bersiveke neyînî, mirad di berde mayîn pir mezin e. Lê fêmdar bin û bizavdar (cesaret bikin) bikin ku li dereke dîn cardîn biceribîne.

REWŞA LI DIJÎ BETAL KIRINÊ

Eger keçik û lawikê we tim û tim bersivên neyînî yên serî lê danê bigre. Pêwîst e, careke dîn bi awayekî berfireh di derbarê pîşeya ku ew dixwaze bike de bifikire. Belkî ligel pîşeya ku keçik û lawikê we yê îdeal, hinek pîşeyên dîn ên ku hindik tên nasîn, ji bo keçik û lawikê we înteresant û li gorî wan bin.
Ji bo çareser kirine vê pirsgirekê têkîliyên xwe bi şêwirmendiya pîşê re daynîn ku ew ne bikaribin ji keçik û lawikê we re alîkar û destek bin.

PÊŞNIYAZÊN NAVBEYNÎ

Digel van lêgerînên întensîv, keçik û lawikê we li ti ciyan, cihekî perwerdeya pîşeyê nebîne, an jî, hîn kêmasiyên dersên dibistanê bên temam kirin hene. Baştir e ku, dawiya dibistana fermî serîlêdane xwe li ba pêşniyaziyeke kêrhatî (musaîd) bike. Pêşniyazên navbeynî li gorî pîvanan salekê didomine û ji bo destpêka cîhana kar amade dike. Hûn dikarin li ba şêwirmendiya pîşê di derbarê pêşniyazên cuda û bihayê wan pêşniyazên ku bibe de xwe agahdar bikin. Pêwîste ku, serîlêdana pêşniyazên navbeynî di meha sebatê de bên kirin. Heke keçik û lawikê we cihekî perwerdeya pîşeyekê bibîne, hûn dikarin wê serîlêdan û qeydê betal bikin.